# Sonya Mîxaylîdo

Sonya Mîxaylîdo



Wergêran ji Nemsawî:
Bedel Revo Mizûrî

## 1- Welat

Her ew asoye li ser me
Were bi hev re dest bi dest
ber bi elinda rojê bi rêkevîn.

## 2- Xatirxwastin

Welatê min
Malîava
Wêneyê te di dilê min de çap kiriye û
li ser axa te şîn û şadî hatine dayîn
Xweştiviya ber dilê min
hemû di nav vî dilî sax in
Evîna min, çi cara ez te ji bîr nakim
Gelo jiyanek nû dest pê dike?
Ey bîrhatinên welatê min
ji te şiyanan werdigrim

## 3- Li ser hindê re

Mafê zelaman bidin
Mafê jinan bidin
Lê di navberê de
rawestin û sereray wê
bîrûra we bimînin

## 4 - Em pêk ve

Dema tu li vêrê nebî dibim
beşek ji te.
Dema amade dibî, ez dizivirim
bo xwe
û cîhanê li xwe dabeş dikim

** Helbestvan Sonya Mîxaylîdo: Ji dayîkbûya sala 1958 ê, bajêrê Gheras li Nemsa. Xwendina xwe li Nemsa bi dawî aniye. Jiyana xwe di navbera Viyena, Lenden û Selanîkî li Yunanê derbas kiriye. Karê mamostatiyê li devera Ştayamarik li Nemsa dike. Min ev parçehelbestên wê ji dîwana wê «Leymun li zivistanê digehît » wergirtine.*